Sînema kurdî ber bi kû ve?

Evîn Şikakî

Ji bo danûstandina li sêr sînema bi şêwekî gişti û sînema kurdî bi taybetî, divê mirov çend pirsan ji xwe bike:
Aya sînema kurdî heye?
Heger hebe, aya kariye ji qunaxa teniyatî ber bi vekirinê ve çûbe?
Aya sînema kurdî pêşketin û çalakbûna xwe daye xuyakirin, her çende ku jiyê wê kême û kadirên akadîmî yên ku tê de kar dikin kêmin û her weha tekinîka wê jî lawaze?
Ew çi girîngtirîn filmin ku hatine berhemhênan?
Rola ragehandina kurdî di geşekirina wê de çi ye û girîngtirîn festîvalên ku di vê derbarê de hatî lidarxistin.
Miletê kurd weku miletên cîhanê, xwedan dîrokeke zengîne ji keltur û wêje û kelporî, gelek zor û zordrî ji aliyê rejêmên ku xwestin û hîna jî dixwazin nasiname, ziman, dîrok û kelporê wî binpê bikin û winda bikin, miletekî ku bi salaye di dirêjahiya dîrokê de bi hezaran qorbanî daye daku nasinama xwe biparêze.
Sîneme bîrdanika miletane û nasinama wan ya çandî ku mîna awênekî rastiya ketwarê wî bi miletî bi êş û qorbanîdan û xewnên wî ve vedguheze, hinek kes dibînin ku sînema kurdî hîna sînemeke tecrîbiye, ezmûniye û di qunaxên xwe yên destpêkê de ye, hinek jî dûr dicin û dibêjin ku sînema kurdî û her çende ku li gor wan îmkaniyatên lawaz û kêm derfetiyê kariye hebûna xwe tekez bike û diyar bike ku ew xwe dan rolekî çalake û şiyan hene ku ketwarî bi hemû hûrbîniyan ve veguheze.
Filmê Yol yê derhênerê kurd "Yilmaz Guneyi" destpêkek rasteqîn bû ji bo sînema kurdî, dema ku wî filmî karî li festîvala Can ya navnetewî li sala 1982 xelata zêrîn wergire.
Nivîser û rexnegir, Burhan Şiwan di pirtûka xwe ya vê dûmahiyê de "Destpêkek bo sînema kurdî" hindek çareseriyên bingehîn pêşkêş

dike da ku sînema kurdî ber bi vejîn û pêşketinê ve biçe û ji wê qunaxa teniyatî derkeve û ji wan çareseriyan jî yê ku nivîser behs dike di pirtûkê de evin:

- dirustkirina peymangehên hunerî û sînema bo avakirina kadirên akadîmî.
- avakirina studiyoyên sînema û tiliviziyonên baş bo sînema.

- pişteyanîkirina rojnamevaniya sînema.
- vekirina erşîfa şoreşên kurdî li pêşber derhêner û sînemavanên kurd.
- Sûdwergirtina ji dezgehên ragehandinê yên ku cemawerên xwe hene ji bo pêşevebirina kulturê bînînê di nav gelê kurd de.
- Bi hêzxistina hunerê şêwekarî û wênegiritna dîcîtal.
- Pêşxistina bizava wergêrana pirtûkan û bi taybet yên girêdayî warê sînema, li dawî jî, avakirina holên berfereh û pêşkeftî yên sînema li bajar û qezayan.

Ji bo ku em bibine xwedan sînemaka bi hêz û pêşketî, divê pişteyaniya madî û giyanî jê re hebe, ji ber vê jî, divê keş û hewayek bihê dirustkirin ku hemû derhêner û sînemavanên kurd hev nas bikin da ku lêguherîna hiziran û dahênanê bihê dirustkirin, ev kare jî bi rêka festîvalan dihê kirin.

Sînema kurdî bi hemû şiyanên xwe ve û bi gavên pola û bi hêz dixwaze cihekî xwe di qada sînema cîhanî de ava bike, ew jî bi rêka ronahîdan li ser qorbanîdan û ketwar û dîroka miletê kurd, heta niha, ev rêke baş bûye û gelek filmên kurdî karîne cihên xwe bi afirandina filmên wesa di nava festîvalên cîhanî de.